# Vîzora Rojê:

## Talîmatên Bikaranînê






*Girtina Rojê ya bi Temamî*

*Duşem, 8ê Nîsana 2024an*

© 2018-2024
Eclipse2024.org

# TERMS AND CONDITIONS FOR USE OF ECLIPSE GLASSES

**Please read these Instructions for Use carefully before using the Eclipse Glasses. Your purchase and use of the Eclipse Glasses constitutes your agreement to these Terms and Conditions. Failure to follow these Instructions for Use may result in serious personal injury, including permanent eye damage. If you do not understand these Instructions or cannot follow them diligently and completely, then you should not look at the Sun at any time, with or without the Eclipse Glasses.**

The term "Eclipse Glasses" refers to the special cardboard-and-polymer optical products, marked "ISO 12312-2" and "SAFE FOR DIRECT SOLAR VIEWING", manufactured by Rainbow Symphony of Reseda CA or American Paper Optics of Bartlett TN, and sold by Eclipse2024.org for the purpose of viewing the Sun during the solar eclipse of April 8, 2024, by or under the direct supervision of a person 18 years of age or above and in accordance with these Instructions for Use.

Observing the Sun directly, without the benefit of eye protection provided by the Eclipse Glasses, will likely result in serious personal injury, up to and including permanent eye damage and blindness. When these Instructions for Use are followed completely and precisely, the undamaged and unmodified Eclipse Glasses have been proven to be safe and effective in allowing direct, short-term viewing of the Sun. If these Instructions for Use are not followed, or if damaged or modified Eclipse Glasses are used, permanent eye injury could result.

You should never look directly at the Sun, with or without the aid of the Eclipse Glasses, if you have any temporary or permanent medical or other condition which either (1) prevents your use of the Eclipse Glasses according to these Instructions for Use, or (2) which predisposes you to an increased or special risk of incurring, worsening, or contributing to the effects of any optical condition, or other medical, health, or other condition, by looking or attempting to look at the Sun.

You should never attempt to perform any other activity (such as driving or walking) while using the Eclipse Glasses.

You agree that if you allow others to use the Eclipse Glasses, you will provide each such user with a copy of these Instructions for Use and will make sure such user reads and understands the Instructions for Use before using the Eclipse Glasses.

By using the Eclipse Glasses to view the Sun, you agree with the following:

(a) you understand these Instructions for Use completely;
(b) you understand and accept the risks associated with improper use of the Eclipse Glasses;
(c) you accept full responsibility for, and assume all risks associated with, the act of viewing the Sun, with or without the use of the Eclipse Glasses; and
(d) the Eclipse Glasses are fragile, and any damage or modification will render them immediately and permanently unusable for their intended purpose.

Release and Limitation of Liability

By way of purchasing and using the Eclipse Glasses, you are irrevocably releasing, indemnifying, and holding harmless the manufacturer and seller from any liability, loss, claim and expense (including attorney's fees), including but not limited to bodily injury or other personal harm, which may result from using the Eclipse Glasses under any circumstances or conditions and irrespective of jurisdiction. Neither the manufacturer nor the seller will be responsible for any damages of any kind, irrespective of reasons, conditions or circumstances, including malfunctioning of the Eclipse Glasses. All risks associated with using the Eclipse Glasses rest solely and entirely with the user, irrespective of whether the Eclipse Glasses are used by the original purchaser or any third party. You fully understand and assume the risks in using the Eclipse Glasses. You confirm that you have read this release of liability and fully understand its terms and that you have given up substantial rights by purchasing and using the Eclipse Glasses.

THE MANUFACTURER AND SELLER OF THE ECLIPSE GLASSES MAKE NO WARRANTY OF ANY KIND, EXPRESSED OR IMPLIED, WITH RESPECT TO THE ECLIPSE GLASSES, INCLUDING BUT NOT LIMITED TO THE IMPLIED WARRANTIES OF MERCHANTABILITY, FITNESS FOR A PARTICULAR PURPOSE, AND NON-INFRINGMENT. NEITHER THE MANUFACTURER NOR THE SELLER SHALL BE LIABLE FOR ANY OTHER DAMAGES, INCLUDING BUT NOT LIMITED TO DIRECT, INDIRECT, INCIDENTAL, SPECIAL, CONSEQUENTIAL, OR EXEMPLARY DAMAGES, WHETHER IN AN ACTION IN CONTRACT OR TORT (INCLUDING NEGLIGENCE AND STRICT LIABILITY), SUCH AS, BUT NOT LIMITED TO, LOSS OF ANTICIPATED PROFITS OR BENEFITS RESULTING FROM, OR ARISING OUT OF, OR IN CONNECTION WITH THE USE OR FURNISHING OF THE ECLIPSE GLASSES OR THE PERFORMANCE, USE OR INABILITY TO USE THE SAME, EVEN IF THE MANUFACTURER OR SELLER HAS BEEN ADVISED OF THE POSSIBILITY OF SUCH DAMAGES. IN NO EVENT WILL THE MANUFACTURER'S OR SELLER'S TOTAL LIABILITY EXCEED THE PRICE PAID FOR THE PRODUCT.

Note Regarding Translations

Translations of these Instructions for Use into various languages are provided "AS-IS" and solely for the convenience of the reader. Eclipse2024.org has made reasonable efforts to ensure the accuracy of the Translations; however, in the event of any perceived discrepancy in meaning or interpretation between the English version and any Translation, the English version will prevail. You should not act in reliance on anything contained in any Translation of these Instructions for Use, but should refer to the official English version.


© 2018-2024
Eclipse2024.org


# GIRTINA ROJÊ YA BI TEMAMÎ – 08.04.2024

**Hûn bi xêr hatin Amerîkaya Bakur!**

Em spas dikin ku we ji bo tecrûbeya girtina rojê ya bi temamî welatê me hilbijartiye. Em hêvî dikin ku her kes vê bûyera newaze ya asîmanî bi awayekî ewle temaşe bike!

*Me ev rêbernameya bikaranîna Vîzora Rojê ji bo dilxweşiya we bi kurdî amade kir. Rêbernameya resen ya ku rêbazên divê bên sepandin, pêşniyarên bikaranînê, ravekirin û nivîsa feraxetnameyê ya têkildarî mijarê ("Talîmat") di nav de ne bi zimanê înglîzî hatiye nivîsandin û teksta bi wî zimanî; ji bo agahdariyên bikaranîna Vîzora Rojê û rêbazên bên şopandin Rêbernameya fermî û ya derbasdar e. Hûn dikarin teksta resen ya înglîîz ji navnîşana https://tinyurl.com/2024Instructions peyda bikin.* ***Heke hûn li gorî rêbernameya Vîzora Rojê tev negerin pêkan e xisarên mayînde bigihîjin çavên we.***

Li gorî stêrnasan, 8ê nîsana 2024an wê roj bi temamî bê girtin. Lê; ji bo temaşekirina vê girtina bi temamî pêwîst e hûn li "Xeta Girtina bi Temamî" bin ku ev ji serekî heta serê din yê Bakurê Amerîkayê ye lê firehiya wê ji 200 km'yî derbas nake. Li ti deverên ku li derveyî vê xetê dimîne girtina bi temamî wê neyê dîtin. Ji ber vê yekê, divê hûn lê binêrin ka hûn di nav xeta girtina bi temamî de ne yan na. Lewre di dema girtina rojê de rêbazên temaşekirinê û bûyerên ku hûn ê bibînin dê li gorî vî ciyî biguherin.



*Xeta Girtina bi Temamî*

## RÊBERNAMEYA HÊSANKIRÎ    TALÎMATÊN BI KITEKIT

Termê "Vîzora Rojê" ya di vê tekstê de, dê ji bo bi awayê ewle nihêrtina li rojê bê bikaranîn û alava bi navê "Eclipse Glasses" ya di beşa feraxetname ya tekstê de pênase dike.

Bikaranîna we ya Vîzora Rojê peymaneke qanûnî pêk tîne. Pêwîst e tenê bi Vîzora Rojê û bi temamî bi awayê ku di vê Rêbernameya Bikaranînê de tê ravekirin li rojê binêrin. Heke hûn talîmatên di vê rêbernameyê de fêm nakin yan jî hûn qebûl nakin ku van rêbazan bêkêmasî û bêçewtî bi kar bînin em pêşniyar dikin ku hûn Vîzora Rojê bi kar neynin û pê li rojê nenihêrin.

# RÊBERNAMEYA BIKARANÎNA VÎZORA ROJÊ

*Agahiyên di vê Rêbernameya Hêsankirî de, ji rêbernameya bikaranîna Vîzora Rojê ya bi kitekit ku bi kurdî hatiye amadekirin hatine berhevkirin ku pêwîst e hûn wan bixwînin, fêm bikin û girtina rojê li gorî wan talîmatan temaşe bikin.*

1) **Serdana navnîşana eclipse2024.org/find-times bikin û bizanin ka li ciyê we yan jî li ciyê ku hûn plan dikin herinê roj – bi temamî yan bi parçeyî – dê bê girtin yan na û demjimêrên destpêkirinê û bidawîbûnê yên texmînî hîn bibin.**
2) **Girtina rojê ya bi temamî, yek ji bûyerên xwezayî yên newaze ye ku hûn dikarin lê temaşe bikin. Lê, ji bo temaşekirina vê girtinê pêwîst e hûn di "Xeta Girtina bi Temamî" de bin ku firehiya wê ji 200 km'yî derbas nake. Heke hûn li derveyî "Xeta Girtina bi Temamî" bimînin, dibe ku hûn nikaribin beşa herî balkêş û newaze ya vê girtinê temaşe bikin. Heke derfetên we hebin, em pêşniyar dikin ku hûn herin ciyekî ku di nav xeta girtina bi temamî de ye!**
3) **Gava hûn Vîzora Rojê ji bo temaşekirina girtina rojê bi kar tînin; alavê wisa daynin ber çavên xwe ku ti beşa xeleka biriqok ya rojê rasterast neyê dîtin. Bi vî awayî çavên we dê ji tîrêjên rojê bên parastin.**
4) **Roja girtina rojê:**
   a. **Heke li ciyê we girtina bi temamî PÊK NEYÊ, hemû deman bi Vîzora Rojê li rojê binihêrin. HEKE HÛN BÊYÎ ALAVEKE PARASTINÊ LI ROJÊ BINIHÊRIN WÊ RÎSKA ZIRANÊN MAYÎNDE YÊN LI ÇAVAN HEBE!**
   b. **Heke li ciyê we girtina rojê bi temamî PÊK BÊ, gava hûn li nav xeta girtina bi temamî bin heta ku beşeke xeleka biriqok ya rojê – beşeke biçûk be jî – xuya bike pêwîst e hûn bi Vîzora Rojê lê temaşe bikin. HEKE HÛN LI GORÎ TALÎMATÊN BIKARANÎNA VÎZORA ROJÊ TEV NEGERIN PÊKAN E KU ZIRARÊN MAYÎNDE BIGIHÎJIN ÇAVÊN WE.**
      i. **Lê; TENÊ di dema kin ya girtina bi temamî de, ango di dema ku xeleka biriqok ya rojê bi temamî li paş hîvê bimîne hûn dikarin Vîzora Rojê bi kar neynin û bi çavên xwe li rojê temaşe bikin.**
      ii. **Heke hûn di dema Girtina Rojê ya bi Temamî de Vîzora Rojê bi kar bînin hûn ê nikaribin girtina rojê bibînin!**
      iii. **Kêliya ku girtina bi temamî xilas bibe û xeleka rojê ya biriqok xuya bibe, PÊWÎST e ku hûn dîsa bi Vîzora Rojê li rojê binihêrin.**
5) **Ango,**

**GAVA BEŞEKE XELEKA BIRIQOK YA ROJÊ XUYA BIKE,
PÊWÎST E HÛN TENÊ BI VÎZORA ROJÊ LI ROJÊ BINIHÊRIN.**

# RÊBERNAMEYA BIKARANÎNA VÎZORA

Pêşî, hin term hene ku pêwîst e hûn wan fêm bikin!

Pênasekirinên têkildarî pêvajoyên girîng yên di dema girtina rojê de pêk tên di lîsteya jêrê de hatine diyarkirin:

| *Qonaxa Girtinê* | *Pênaseya Qonaxa Girtinê* | *Çawa Xuya Dike* (Ji bo girtina bi temamî) | *Çawa Xuya Dike* (Ji bo girtina bi parçeyî) |
|---|---|---|---|
| **C1** | **Girtina bi parçeyî dest pê dike** |  |  |
| **C2** | **Girtina bi temamî dest pê dike** |  | * Girtina bi temamî tune ye! * |
| **Nîveka Girtinê** | **Nîveka girtinê** |  |  |
| **C3** | **Dawiya girtina bi temamî** |  | * Girtina bi temamî tune ye! * |
| **C4** | **Dawiya girtina bi parçeyî** |  |  |

© 2018-2024
Eclipse2024.org

## 1) TALÎMATÊN JI BO BIKARANÎNA VÎZORA ROJÊ PÊWÎST IN



1) [*heke pêkan be*] Vîzora Rojê ji pakêta wê bi baldarî derxin.
2) Dema hûn bi kar naynin, Vîzora Rojê hilînin.
3) Her car beriya bikaranînê Vîzora Rojê baş kontrol bikin. Heke li ser fîlma lensî xêz yan xisarên berbiçav hebin, vîzorê bavêjin çopê û [vîzoreke din ya saxlem bi kar bînin](#).
4) Ti caran bi vîzorên ku li ser fîlma wan ya lensî xêz yan xisar hebin li rojê nenihêrin.
5) Fîlma lensî ya ku tîrêjên rojê disefîne ji ser Vîzora Rojê ranekin û ti caran bi wê li rojê nenihêrin.
6) Vîzorên Rojê yên ku bi awayê rast hatine çêkirin û bêxisar in tîrêjên rojê ku li zirarên mayînde didin çavan, tîrêjên ultraviyole yên bizirar û tîrêjên din yên rojê disefînin û dadixin asteke ewle. Vîzora Rojê ya li ber destê we, heke li gorî rêbernameyê bê bikaranîn, hemû deman ji bo nihêrtina li rojê bi temamî ewle ye. Di demên roj tê girtin de wê ti “Tîrêjên Girtinê” yên temaşekirina rojê xeter bikin pêk neyên.
7) **HEMÛ demên ku ÇI beşeke xeleka biriqok ya rojê xuya bike, ji bo ku hûn rojê bi awayekî ewle temaşe bikin, pêwîst e hûn Vîzora Rojê li gorî di vê tekstê de tê ravekirin bi kar bînin. Ji her çi çavkaniyê dibe bila bibe, di demên texmînî yên destpêkirinê û bidawîbûnê yên girtina rojê (ku li jorê wekî C2 û C3 hatine binavkirin) de jî dema beşeke biçûk ya xeleka biriqok ya rojê xuya bike pêwîst e hûn bi Vîzora Rojê li rojê binihêrin.**
8) Vîzora Rojê; bi teleskop, dûrbîn, wênekêş, berçavk yan jî neynikê yan jî bi amûrên din yên optîk ku dikarin tîrêjên rojê derbas bikin û veguhêzin re bi kar neynin.
9) Wê kêliyê ti alavên optîk ku fîltreya wan ya taybet tune ye û pêkan e tîrêjên rojê berhev bikin yan biguhêzin nedin ber rojê û ji vîzora wan li rojê nenihêrin.
10) Destûra bikaranîna Vîzora Rojê nedin kesên ku nikarin vê rêbernameyê bixwînin û fêm bikin yan jî nikarin berpirsyariya qanûnî wergirin yan jî bi awayê demkî astengdar in. Tika ye ji bo temaşekirina girtina rojê Vîzora Rojê nedin ber çavên ajalan.
11) Rêbaza bikaranîna Vîzora Rojê:

    Di demên ku xeleka biriqok ya rojê xuya dike de bila vîzor her tim li ber çavên we be û bi Vîzora Rojê ya bêxisar li rojê binihêrin. Heke hûn vîzoreke wekî berçavka kartonî bi kar tînin, hûn dikarin bêyî ku xisarekê bidinê, wê bitewînin û wekî berçavkeke rojê bi kar bînin. Ji bilî dema girtina bi temamî (heke li ciyê we girtina bi temamî pêk bê, ji bilî demên bi texmînî di navbera demên C2 û C3yê de) tenê bi Vîzora Rojê li rojê binihêrin.



12) Gava hûn Vîzora Rojê bi kar bînin; ji bo parastina çavên xwe ti alavên optîk pê ve nekin û li gel alavên din yên optîk li rojê nenihêrin.
13) Heke têkildarî van talîmatan pirs yan jî mijarên din yên hûn meraq dikin hebin hûn dikarin bi riya malpera me eclipse2024.org’ê bi me re peywendiyê çêkin: https://tinyurl.com/glasses-questions.

## 2) *JI BO CIYÊ XWE DEMJIMÊRÊN TEXMÎNÎ YÊN DESTPÊK Û DAWIYA GIRTINA ROJÊ HÎN BIBIN*

Li gorî agahiyên li ser navnîşana eclipse2024.org/find-times dê diyar bibe ka li ciyê we girtina bi temamî pêk tê yan nayê. Ji qutîka li jêrê ya li gorî we ye nîşan bikin:

### *Girtina li ciyê min:*

| BI TEMAMÎ YE | NE BI TEMAMÎ YE |
|---|---|

*(Vebijarka rast nîşan bikin.)*

| | |
|---|---|
| **Heke li ciyê we girtina *BI TEMAMÎ* pêk bê herin beşa “LI VIRÊ *GIRTINA BI TEMAMÎ* PÊK TÊ” ya li jêrê:** | **Heke li ciyê we girtina *NE BI TEMAMÎ* pêk bê herin beşa “LI VIRÊ *GIRTINA NE BI TEMAMÎ* PÊK TÊ” ya li jêrê:** |

## ** LI VIRÊ *GIRTINA BI TEMAMÎ* PÊK TÊ **

Hûn di nav xeta girtina bi temamî de ne! Tecrûbeyeke newaze ku kêm tê dîtin li pêşiya we ye! Gelekî girîng e ku hûn zanibin ka girtina bi temamî kengê dest pê dike û kengê bi dawî dibe. Divê hûn vê li gorî demjimêrên hûn li tabloya jêrê binivîsin diyar bikin. Ji ber ku di dema girtina bi temamî de dê ti beşa xeleka biriqok ya rojê xuya neke, dê asîman û rûerd tarî be û ev ê ji we re nîşaneyek be.

1) Ji bo ciyê xwe demjimêrên texmînî yên destpêkê û dawiyê yên qonaxên girtinê ku li ser navnîşana eclipse2024.org/find-times tên hesabkirin li tabloya li jêrê binivîsin (Ji bîr nekin ku demjimêra xwe li gorî demjimêra herêma hûn lê ne eyar bikin!):

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| ***Beriya C1ê*** | * Girtin tune ye * | |  |  | Vîzora Rojê **BI KAR BÎNIN** |
| ***C1*** | **Demjimêra destpêka girtina bi parçeyî:** | |  |  | Vîzora Rojê **BI KAR BÎNIN** |
| ***C2*** | **Demjimêra destpêka girtina bi temamî:** | |  |  | Hûn dikarin **piştî qonaxa C2yê** vîzorê bi kar neynin û bi çavên xwe rojê binihêrin |
| ***Nîveka Girtinê*** | **Demjimêra pêkhatinê:** | |  |  | **Hûn dikarin bêyî vîzorê bi çavên xwe li rojê temaşe bikin!** |
| ***C3*** | **Demjimêra bidawîbûna girtina bi temamî:** | |  |  | Dîsa Vîzora Rojê **BI KAR BÎNIN** |
| ***C4*** | **Demjimêra bidawîbûna girtina bi parçeyî:** | |  |  | Vîzora Rojê **BI KAR BÎNIN** |
| ***Piştî C4ê*** | * Girtin tune ye * | |  |  | Vîzora Rojê **BI KAR BÎNIN** |

2) Heke hûn di xeta girtina bi temamî de bin jî; beriya C2yê û piştî C3yê, tenê bi Vîzora Rojê li rojê temaşe bikin.

© 2018-2024
Eclipse2024.org

3) Hûn dikarin rasterast (bêyî Vîzora Rojê) TENÊ:
    a. Heke ji bo ciyê we girtina rojê ya BI TEMAMÎ tê hesabkirin (heke hûn di xeta girtina bi temamî de bin), Û
    b. Di navbera qonaxên destpêk û dawiyê yên girtina BI TEMAMÎ ango di navbera C2 û C3yê de, Û
    c. **Di dema ku xeleka biriqok ya rojê bi temamî li paş hîvê be li rojê binihêrin.**

Demên destpêkê û dawiyê yên girtina bi temamî (C2, C3) dê li gorî ciyên cografîk yên cuda gelekî cuda bin. Pêwîst e ku hûn demên texmînî yên destpêk û dawiya girtinê ji berê ve hîn bibin û dema xwe li gorî wê eyar bikin.

4) Ji bîr nekin, demên destpêk û dawiyê yên girtina bi temamî yên ji bo ciyê we li gorî lîsteyê yan jî li gorî çavkaniyên din çi dibin bila bibin; **di dema ku xeleka biriqok ya rojê xuya bike de pêwîst e ku hûn rojê tenê bi Vîzora Rojê temaşe bikin**.

5) Pêvekên xêzkirinan alîkariyê didin fêmkirina van talîmatan.

---

***Pêwîst e ku hûn van ravekirinan bixwînin, fêm bikin û bêkêmasî pêk bînin:***

## PÊWÎST E KU HEMÛ TALÎMATÊN JI BO VÎZORA ROJÊ BI AWAYEKÎ EWLE BÊ BIKARANÎN BÊN SEPANDIN.

# GAVA BEŞEKE XELEKA BIRIQOK YA ROJÊ XUYA BIKE, *TENÊ* BI VÎZORA ROJÊ LI ROJÊ BINIHÊRIN.

© 2018-2024
Eclipse2024.org

## ** LI VIRÊ *GIRTINA NE BI TEMAMÎ* PÊK TÊ **

Ji ber ku hûn li derveyî xeta girtina bi temamî ne, hûn ê nikaribin beşa herî balkêş û newaze ya vê girtinê temaşe bikin. (Em pêşniyar dikin heke pêkan be hûn herin ciyekî di nav xeta girtina bi temamî de!)

1) Ji bo ciyê xwe demjimêrên texmînî yên destpêkê û dawiyê yên qonaxên girtinê ku li ser navnîşana eclipse2024.org/find-times tên hesabkirin li tabloya li jêrê binivîsin (Ji bîr nekin ku demjimêra xwe li gorî demjimêra herêma hûn lê ne eyar bikin!):

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| ***Beriya C1ê*** | * Girtin tune ye * | |  |  | Vîzora Rojê **BI KAR BÎNIN** |
| ***C1*** | **Demjimêra destpêka girtina bi parçeyî:** | |  |  | Vîzora Rojê **BI KAR BÎNIN** |
| ***Nîveka Girtinê*** | **Demjimêra pêkhatinê:** | |  |  | Vîzora Rojê **BI KAR BÎNIN** |
| ***C4*** | **Demjimêra bidawîbûna girtina bi parçeyî:** | |  |  | Vîzora Rojê **BI KAR BÎNIN** |
| ***Piştî C4ê*** | * Girtin tune ye * | |  |  | Vîzora Rojê **BI KAR BÎNIN** |

*(Ji ber ku girtina bi temamî wê neyê dîtin, li ciyê we qonaxên C2 û C3 wê pêk neyên!)*

1) **Ji ber ku girtina bi temamî wê neyê temaşekirin, pêwîst e hûn ji bo temaşekirina rojê HEMÛ DEMAN Vîzora Rojê bi kar bînin.** Heke derfet hebin, em pêşniyar dikin ku hûn herin ciyekî di nav xeta girtina bi temamî de. Di nav xeta girtina bi temamî de jî ji bo temaşekirina girtina bi parçeyî pêwîstiya we wê bi Vîzora Rojê hebe.
2) Pêvekên xêzkirinan alîkariyê didin fêmkirina van talîmatan.

---

***Pêwîst e ku hûn van ravekirinan bixwînin, fêm bikin û bêkêmasî pêk bînin:***

**PÊWÎST E KU HEMÛ TALÎMATÊN JI BO VÎZORA ROJÊ BI AWAYEKÎ EWLE BÊ BIKARANÎN BÊN SEPANDIN.**

**GAVA LI ROJÊ BINIHÊRIM PÊWÎST E HER CAR VÎZORA ROJÊ BI KAR BÎNIM.**

© 2018-2024
Eclipse2024.org

PDF

Kurdî
(Kurmancî)

GRAN ECLIPSE NORTEAMERICANO

GRANDE ÉCLIPSE NORD - AMÉRICAINE

GREAT NORTH AMERICAN ECLIPSE

ECLIPSE .org 2024